Derçûn ji desthelata manayê

Hoşeng Şêx Mihemed

Xwendinek bo binemayên giştî yên şiîra devera Behdînan

Xwendevanên hêja.. Hevalên kovara Nûbûn, ji ber giringiya vê babetê li jêrê, me bi fer dît em weku goşeyekê û bi çend xelekan ve li jêr navê "derçûn ji desthelata manay, xwendinek bo binemayên giştî yên şiîra devera Behdînan" ji nivîsîna nivîserê jêhatî Hoşeng Şêx Mihemed, bi wê meremê ku mifayekê giştî hebe û dîtin û boçûnên cuda cuda jî li ser bihêne wergirtin. Bi bihaneya hindê ku ev babetê li ser şiîra devera Behdînan hatiye nivîsîn, zanînekê li ser pêzanînên xwendevanan zêde bike. Hûn û hizirmendiya Hoşeng Şêx Mihemed. **Nûbûn**

Gumanek bo te.
Xwendevanên hêja.
Xweşhalim ku şiyam evî berhemî bikime di destên te de ku berhemê mandîbûna çendîn şev û rojane, xweşhaliya min ji vê çendê dihê ku ez wek Hoşeng dişêm binivîsim. Li ser babetek xweş pir biha ku şiîre dinivîsim bi zarevek şirîn û pir xweş bo min

hatîne nivîsîn. Ev vekolîne, di vê xwendinê de min bi azadî kar kiriye, azad ji pîroziya şiîrê û nivîsînê, azad ji nav û qebare, kêş û qelemê her kesekî. Azad ji şerm û neşermkirinê, hêvîdarim tu jî, azad vî berhemî bixwînî. Berî hemûyan, azad ji min, wek nivîser û diktatorek biçûk di vê xwendinê de.
Xwendevanê hêja, wê gavê ez hez ji te dikim, demê tu bişêyî min têk bişkênî, xwendinek cuda û dij û dûr ji min di vî berhemî de berhem bînî, ez hez dikim tu nezanîna min di vî berhemî de diyar bikî û kêmasiyên hizirî, şiîrî û rexneyî li cem min aşkira bikî.
Min divê xwendevanek bî, bişêy min biherfînî bi guman, pirsiyar û bersivên xwe yên taybet bi te û bi cîhanbîniya te ve.
Çunke berî te min wesa kiriye û min tuyê herfandî û herşandî, tu li cem min tijî guman û nihênî û pirsiyarî, hemîşe ez li te digerim û heta niho jî min çi nasname nedane te.
Bizanim tu dê çi bikî..?

Pişka yekem

Mana di navbera şiîr û şairî de

Şiîr
Di vê derê de her pênasek bo şirê, pênaseke dikeve bin desthelata manayekî yan çend manayan. Lê wek pêwîstiyek bo vê vekolînê ez neçarim pênasekî bidime şiîrê, bi umêdê ew pênase bişê gelek rave û xwandinên cuda û cuda û hemereng û hevdij bibexşe xwandevanî.
Hêvîdarim jî kes bi vê pênasê nedaxbar be û ne wek pênasek yeqînî bixwîne, ev babete ezmûnek nûye û wek yekem ezmûn jî ez bi gumanek şiîrî ne wek bi gumanek rexneyî dinivîsim, anku vê gavê bi tinê guman dibe raber bo vê xwandinê û çendî bişêm pêkol dikim xwe ji desthelata bêsinora manayan derbaz bikim, bo wê ku şiîr bişê bi xwe bibe desthelatek xweser û xwedan cîhana xwe ya taybet.

Bi guman ve dibîjim: Şiîr di vê gavê de ku ez tê de xwandina xwe dikim, renge ji heqîqetê nêzîktir be, heger nivîsînek be, ji bilî ku hunerî, hizirî û edebî ye, pitir jî ruhî be yan remzî be, yan rewankî be, serederiyeka rewankî li gel hemû babetan bike û pitir jî cexitê ji layena remzî û ruhiya diyarde û çemk û têgehiştinên hebûnê bike

û pitir jî kûrbûn be di ruha babet û peywendiya mirov, hebûnê, mirov û jiyanê. Û pitir wan cîhanbînî û jiyanbîniya pêşber bike ewên mirov neşê bi desthelata hizirî, edebî, felsefî, dînî, zanistî û beşên wan yên cuda cuda rave bike.
Anku şiîr qesekirin be li ser rewana mirovî.. Remiz û hêm û amajên hebûna wî û peywendiyên wî li gel mirovan û ligel hebûnê. Eve heger bişêt?! Çunke bo vê çendê şiyan pêwîstin, di parçeyeka din de em dê behsî şiyanên şiîrî dikin.
Şiîr pêwîste çalakiyek cuda be ji çalakiyên din yên siyasî, felsefî, dînî, hiziriya mirovî, hem wek şêwe û hem wek naverok.
Pêwîste şiîr nebe tiştek û babetek din, pêwîste vê çendê jî rohin bikim ku şiîr ji babetên din kûrtir, zehmettir, geriyanek dûrtir û firehtir e.
Siyaset, dîn, felsefe, zanist, bi amîre û rêkên xwe yên taybet bi xwe ve, basê hebûnê dikin û bersivên xwe li hember hebûnê didene me, lê şiîr, basê hebûna me nake, belkî hemîşe şiîrê divêt bibite hebûnek taybet, bi rengek taybet bo me wê hebûnê rave bike ku cudaye ji raveyên din, renge piraniya raveyên dî.. Raveyên yeqînî û bê gumanin, lê ya şiîrê raveyên gumankî û ne yeqînîne. Heger warên dî pitir bersiv bin bo pirsiyarên mirovan, eve şiîr pitir pirsiyaran arastey mirovan dike û heger bersivê jî bide.. Eve bersivek tijî guman û pirsiyar dide.
Anku heger dîn û felsefe û siyaset û zanist bersivan li ser hebûna me bidene me. Eve şiîr dihêt, gumana li ser wan bersivan dike û careka dî we li me dike em gumanê di rave û tefsîrên wan da bikîn û qan nebîn û bi bersivên wan razî nebîn, anku berdewam hêz û şiyanekê didete me bo lêgeriyan û keşifkirineka zêdetir û kûrtir.. Ku kayeyên dî vî delîvey nadene me.
Heger warên dî komeka manayan bidene me, pêwîste şiîr heman manayan nede me, pêwîste ew manayên ku felsefe, dîn, babetên dî neşên xwe jê xelas bikin, pêwîste şiîr bikaribe xwe jê xelas bike, bi baweriya min şiîrên azad û ne azad.. Nemir û mirar dê li vê derê jêkcuda dibin, renge ewên dişên xwe ji wan manayan xelas bikin bibine şiîrên nemir û azad bibin ji her ravek mirov bo bike û berûvajî şiîrên ne azad renge dîn, yan siyaset, yan zanist, yan felsefe dişê hemû manayên xwe lê bar bike û bike babetek ne şiîrî.
Dîsan jî pêwîste bizanîn ku ruha şiîrê ji wê derê çêdibe û ji dayik dibe demê manayên xwe yên taybet bi peyv û kerestên xwe çêdike û bi rêka zimanî dişê hebûnek taybet bi xwe ve biafrîne.

Şiîra azad, ew bi xwe, xwe diselmîne, ne wek siyaset, yan felsefe, yan dîn, yan her kayek ji bilî şiîr bihê û îsbata hebûna wî bike, anku tiştek seyre demê kêfa me dihê ku şiîrên me, wek parçeyeka felsefî, yan bi dîtinek siyasî, yan ravek dînî bihê xwandin, renge bo nivîseran xweş be demê berhemê wan yê şiîrî bigehîne pila felsefê bo nimûne, renge ew nizanin ku cîhana şiîrî ji cîhana felsefê cudaye, ciwantir, kûrtir, pir gumantir, firehtir, heqîqettir û estatîkîtire. Eve jî hem şair, hem rexnegir û xwandevanên me dibe ber hindek pirsan ku hejarî û nedariya wan nîşan dide li hember şiîrê bi pile êk. Vêca li hember kayeyên dî bi pile dû, sêyem car jî peywendiya wan kayeyan bi hebûnê, peywendiya wan bi nivîsînê, bi mirovî û jiyanê.

Şiîr bi xwe di nav xwe de hebûna xwe çêdike, hebûna xwe diselmîne, hebûneke ku renge siyaset, felsefe, dîn, zanist û raveyên cuda cuda bikêşe nav hebûna xwe û mirov jî tê de bibe cidîtîrîn ezmûn û li gor qanunên taybet bi şiîrê careka dî mirov û hebûna mirovî dihê darêtin.

Renge piraniya kayeyên dî ji bilî şiîrê neşên bi azadî basê hemû babetan bikin û li gelek erdan li hember hindek pirsiyar, guman û ramanan xwe bêdeng bikin, yan bersivek yeqînî bibe rêgir li hember dûvçûna mirovî bo diyardeyên mirovayetî û hebûnê. Renge dîn mirovî li qonaxeka hizirikirinê birawestîne, renge siyaset gelek kot û peywendiya bo mirovî çêbike, renge felsefe bi hindek raveyên lojîkî mirovî bihêle li biyabana pirsiyaran.. Lê şiîr, nexêr hemû gavan bê sinor pirsiyaran çêdike û nabêje mirovî "bese, yan hiş be, yan qedexeye, yan xwe bêdeng bike, yan pirsiyar neke, yan guneye, herame, şerme htd."

Cîhana şiîrê, cîhana mirovî ye bi hemû rehendan ve, cîhaneke ku şerm û bê şermî tê de dişên li hember yek wek yek pirsiyar bikin û dûvçûna li mirovî bikin, mirovî bibine qulaçkên tarî û nepenî, bêyî ku bibêjin eve diruste û eve nediruste.

Di şiîrê de çi heqîqetên reha bo çemkên ciwanî û kirêtî, başî û xirabî, mirovperwerî û xiyanetê, rastî û direwê.. Û çemkên dî nînin.

Di heman dem de çi şair jî neşên direwan li şiîrê bikin û berhemên neşiîrî li ser milê şiîrê bar bikin.